Rapora YASA ya mehane
Navenda Kurdî ji bo Lêkolîn û Rawêjkariya Yasayî

Çileya paşîn 2010

YA§A e.V.

Kurdish Centre for Legal Studies and Consultancy

Kurdisches Zentrum für juristische Studien und Beratungen

Navenda kurdî ji bo lêkolîn û rawêjkarîya yasayî

المركز الكردي للدراسات والاستشارات القانونية

YASA e.V.
Postfach 7624
53076 Bonn
www.yasa-online.org

Îsa Begê Xelef

Naverok:

Kesayetiya oldar a naskirî ya Kurd Şêx Ebdil Rezaq Cengo hate binçavkirin
Leşkerê Kurd Îsa Begê Xelef hate kuştin
Malpera fermî ya Şepêla Pêşeroja Kurd li Sûriyê hate sergirtin
Hin welatiyên Kurd bi tewana arandina kînên zamî (Tayifî) hatin zindankirin

Kesayetiya oldar a naskirî ya Kurd Şêx Ebdil Rezaq Cengo hate binçavkirin

Di roja 01.01.2010an de Ewlekariya Ezmanî ya Sûriyê bi balefirgeha Helebê kesayetiya oldar a naskirî ya Kurd Şêx Ebdil Rezaq Cengo binçav kir. Şêx Ebdil Rezaq Cengo xwesti bû serdana kurekî xwe li Mîrgehên Erebî yên Yekgirtî bike. Şêx Ebdil Rezaq Cengo di sala 1948an li bajarê Qamişlo ji dayik bûye û bawernameya bilind Olnasiya Misilmaniyê ji zanîngeha Şamê wergirtiye. Ewî weke mamosteyekî di dibistanên Qamişloyê de bi salan kar kiriye, herwiha li dibistanên Mîrgehên Erebî yên Yekgirtî jî, beriya ku vegere Sûriyê, xebitiye.

Leşkerê Kurd Îsa Begê Xelef hate kuştin

Di roja 10.01.2010an de malbata leşkerê Kurd Îsa Begê Xelef termê kurdê xwe wergirt. Ji wan re hate ragihandin, ku kurê wan xwe bi guleyekê kuştiye. Rêzdar Îsa Xelef ji nîştecihên bajarê Kobanî ye û di sala 1991an de ji dayik bûye. Ewî erkê parastina welat di koma leşkerî ya 15an de li bajarê Deraa pêk tanî. Çend rêxistinên mafên miroc li Sûriyê ragihandin, ku Îsa-beriya kuştina wî- ji gilî û gazinên xwe li cem malbata xwe kiri bûn, ku rayedarên wî lê dixin û bi awayekî pîs dan û standinê pê re dikin.
Hêja ye gotinê, ku kuştina leşkerên Kurd di artêşa Sûriyê gelek caran pêk hatiye, nexasim di van

herdû salên borî de, û tê gotin, ku ev bûyerine xwekuştinê ne, bêyî ku vepirsîn bo van bûyeran pêk bên.

Malpera fermî ya Şepêla Pêşeroja Kurd li Sûriyê hate sergirtin
Şepêla Pêşeroja Kurd li Sûriyê ragihand, ku malpera wê ya fermî ji layê hêzên ewlekariya Sûriyê ve hatiye sergirtin. Tê zanîn, ku piraniya malperên elektronî li Sûriyê sergirtî ne, nexasim ên Kurdî û yên hevrikiya Erebî, yên ku rexneya desthilatdariya Sûriyê dikin.

Hin welatiyên Kurd bi tewana arandina kînên zamî (Tayifî) hatin zindankirin
Di roja 17.01.2010an de dadwerê tek ê leşkerî li Qamişlo sezaya zindanê li van welatiyên Kurd birî. Ew jî ev in: Ebdil Selam Şêxmûs Mehmûd, Xelîl Ibrahîm Mihemed, Mihemed Şêxo Îsa û Ramî Şêxmûs El Hesen.

-Ji bo Mihemed Şêxo Îsa, Xelîl Ibrahîm, Ebdil Selam Şêxmûs Mehmûd û Ramî Şêxmûs El Hesen şeş zindan hate birîn. Ew bi arandina kînên zavî (mezhebî) hatin tewanbarkirin.
-Ji bo Ebdil Selam Şêxmûs Mehmûd û Ramî Şêxmûs El Hesen mehek zindan û 100 hezar leyreyên Sûriyê hate birîn. Ew bi aradina tavlihevî xerabiyê hatin tewanbarkirin.

-Herdû sezayên Ebdil Selam û Ramî bi sezayê hatin pejirandin. Ew jî şeş meh zindan e.

-Sezaya zindanê ji bo Mihemed Şêxo Îsa û Xelîl Ibrahîm ji şeş mehan daket sê mehan.

-Sezaya Ebdil Selam Şêxmûs Mehmûd û Ramî Şêxmûs El Hesen ji şeş mehan daket sê meh û nîvan.

Tê zanîn, ku ev welatiyên Kurd di Avdara 2009an de hati bûn binçavkirin û di Avrêla 2009an serbest hati bûn berdan. Ew wî çaxî ji ber rawestandina li ser giyanên pakrewanên Helepçeyê hati bûn girtin.